Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1005 | 16-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Heybeta wan dewisand!

**Peykerên ku axlebê wan ji mermer in, zû bi zû nayên tewandin. Lê peykersaz Adam Parker Smith, mermer weke hevîr bikaraniye û ji hêla hestan ve ji wê hişkbûna mermerî rizgar kiriye. Helbet peykerên wî jî dîsa hişk in û ji mermer in lê ew bi nihêrîneke cuda li peyker fikiriye.**



Adam Parker Smith, bi koleksiyoneke balkêş ya peykeran ku navê wê kiriye "Crush" derdikeve hemberî kesên hez ji huner dikin. Peykerên xwe ji formên klasîk derxistine û bi formekî cuda ew sêwirandine. Yanî berê me gelek peyker dîtibûn, lê peykerên ku wî sêwirandine, yên dewisandî ne! Wî mermerên xwe eciqandiye. Çawa ku di qutiyekê de hiştibe û paşê qalibê van qutiyan derxistibe, peykerên wî wiha xuya dikin.

Parker Smith, demeke dirêj li Romayê maye û lêkolînên xwe yên di vî warî de li wir bi rê ve birine. Dema ew li Romayê dimîne, gelek peykeran jî dibîne û li dîroka wan dikole. Wî nexasim ji peykêrê Bernini yê "David", "Apollo Belvedere" û "Augustusê Prima Portayî" hez kiriye û ev peykerên hanê, bi hev ve eciqandine û bi dirûvên nû ew derxistine pêşberî peykerhezan. Wisa kiriye ku em li van peykeran careke din û bi awayekî din bifikirin.

Parker Smit ji bo karibe van peykeran bi vî awayî çêke, bi tîma dîjîtal a "Muzeya Uffizi" re xebitî û peykerên ku ji dema Helenîzmê û Barokê mane, bi riya bernameyên 3D ji nûve sêwirandin. Beriya ku ew bikevin vî halî, pirr bi heybettir xuya dikirin, lê Parker Smith, ev şaheser bi nihêrîneke cuda şirove kirin û êdî ew ji berê cudatir tên xuyanê. Yanî, wî bi heybeta van peykeran lîst û li gorî xwe ew peyker ji nû ve şirove kirin.

***Ozgurpolitika***

# Ji sedî 69 ê jiyana kûvî kêm bû

**Li gorî rapora Weqfa Parastina Xwezaya Cîhanê, populasyona jiyana kûvî ya cîhanî ji sala 1970'î û vir ve di asta ji sedî 69 de kêm bûye.**



Weqfa Parastina Xwezayê ya Cîhanê (WWF) roja Pêncşemê raporek weşand û nîşan da ku di navbera salên 1970 û 2018'an de populasyona jiyana kûvî ya cîhanê ji sedî 69 kêm bûye. Ji bo sedemên vê kêmbûnê jî işaret bi guhertina avhewayê û kiryarên mirovan kir. WWF'ê di navbera salên 1970 û 2018'an de guhertina global a li bejahî, hewayî û deryayî ya 32 hezar populasyonên ji 5 hezar û 230 cûreyên movikdar şopand.
Rapora ku ji aliyê 89 nivîskaran ve hate amadekirin balê dikişîne ser kêmbûna windahiya avhewayê û cihêrengiya biyo û weke sedem jî işaretê bi xerabûna sîstema bejahî û deryayî, talankirina zêde ya nebat û heywanan û guhertina avhewayê dike.
Raporê ragihand ku vê yekê bandora herî giran li Başûrê Emerîkayê û Karabîkê kiriye û hişyarÎ da ku daristanên baranê yên Amazonê hindik mane ku bêkêr bibin.
WWF'ê diyar kir, ku niha milyonek cûreyên heywan û nebatan li ber tunebûnê ne.

Di raporê de hate destnîşankirin ku girîng e hikumet, şîrket û gel bi lezgînî bikevin nava liv û tevgerê. Civîna Peymana Cihêrengiya Biyolojîk a Neteweyên Yekbûyî (COP15) tê payin ku meha Kanûnê li Montrealê bê lidarxistin.

***ANF***

# Letîf Reşîd bû Serokkomarê Iraqê

**Di tora duwem a hilbijartina serokkomarê Iraqê de Letîf Reşîd bi serket û bû serokkomarê nû yê Iraqê.**

Di tora duwem a hilbijartina serokkomarê nû yê Iraqê de Letîf Reşîd bi 162 dengan wek serokkomarê nû yê Iraqê hat hilbijartin. Her wiha Berhem Salih jî 99 deng wergirt.

**Ebdûlletîf Reşîd kiye?**

Di sala 1944'an de li Silêmaniyê hatiye dinê. Sê zarokên wî hene (2 kur, 1 keç). Di navbera salên 2010-2022'an de şêwirmendê serokkomarê Iraqê bû. Her wiha wezîrê çavkaniyên avê yê Iraqê bû. Hevjînê Endama Polîtbûroya YNK'ê Şanaz Îbrahîm Ehmed e.

Piştî hilbijartina serokkomarê nû, Berhem Salih daxuyaniyek da

Namzetê yekem ê YNK'ê yê ji bo serokkomarê Iraqê Berhem Salih piştî ku di hilbijartinê de bi serneket û namzetê duwem yê YNK'ê Letîf Reşîd bi serket, peyamek belavkir û got, "Ez girêdayî bicihanîna erkên xwe yên di jêr banê nîştimanperwerî û piştgiriya di rêya reformande bûm."

Berhem Salih di peyama xwe de got, "Min rêz ji serokkomartiya Iraqê re girt, bi berdewam ez girêdayî bicihanîna erkên xwe yên di jêr banê nîştimanperwerdî û di rêya reformên ji bo welatek hêja û



xizmetê ji hemwelatiyan re bikim de meşiyam."

Her wiha Berhem Salih pîrozbahî li serokkomarê nû yê Iraqê Letîf Reşîd kir û hêviya serkeftinê jêre xwest.
Li aliyê din serkirdeyên Iraqê jî li ser hesabên xwe yên medya dijîtal pîrozbahî li serokkomarê nû yê Iraqê dan û hêviya serkeftinê jêre xwestin.

***ROJNEWS***

Sudoku:Pirs 15

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 9 | | 7 | | | | | 2 |
| | 5 | 8 | | | | 9 | | |
| | 1 | 6 | 2 | | 5 | | | 3 |
| | | 7 | | 5 | 6 | | | |
| 9 | | | | | | | | 4 |
| | | | 4 | 3 | | 7 | | |
| 6 | | | 9 | | 3 | 4 | 1 | |
| | | 3 | | | | 6 | 9 | |
| 5 | | | | | 8 | | 3 | |

Sudoku: Bersiv 14

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 8 | 2 | 7 | 3 | 6 | 4 | 9 | 5 |
| 3 | 4 | 9 | 5 | 8 | 2 | 7 | 1 | 6 |
| 7 | 6 | 5 | 4 | 1 | 9 | 8 | 3 | 2 |
| 6 | 5 | 4 | 3 | 7 | 1 | 2 | 8 | 9 |
| 8 | 9 | 7 | 6 | 2 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 2 | 3 | 1 | 8 | 9 | 4 | 6 | 5 | 7 |
| 5 | 7 | 6 | 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 8 |
| 4 | 2 | 8 | 1 | 5 | 7 | 9 | 6 | 3 |
| 9 | 1 | 3 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 4 |

Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ambargo (Fransî) | **1. Qedexekirina firotina malekî li welatekî. (yan ew bifiroşe, yan hin bifiroşinê) Astengkirin, rênedan. Gemaro, hîsar: Amerîka ambargo danî ser Îranê. 2. Astengkirina têkiliya weletekî bi dinyayê re. Gemaro, hîsar. 3. Astengkirina kesekî bi kesên din re. Gemaro, hîsar.** |
| Diyalog (Fransî) | Axaftina dudu, yan çend kesan li pêşberî hev. Danûstandin. |
| Festîval (Fransî) | 1. Xwepêşandana pîşeyî: Festîvala filman hat lidarxistin. 2. Şahî: Ji bo pîrozkirina Newrozê festîvalek hat lidarxistin. 3. Xwepêşandana ji bo berhemeke binavûdeng ya herêmekê: Festîvala zebeşên Amedê. |
| Komîn (Fransî) | Komek ku bi hev re dixebite û hatina xwe par ve dike. |
| Komîte (Fransî) | Di asta jêr de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. Licne. |
| Konser (Fransî) | Stirangotina hunermendan li pêşberê civakê. |
| Konsey (Fransî) | Di asta herî jor de çend kesên ji bo kirina karekî, yan meşandina wî, yan nûnertiya saziyekê hatîn erkdarkirin. |
| Mihrîcan (Aryenî) | Festîval. Ereb jî bi kar tînin. |
| Paradîgma (Fransî) | 1. Mînak, model, nimûne. 2. Kombûna nirxan. 3. Li gorî hişmendiyekê hêman pîvan û rêgezên jiyana civakê: Rêveberiya Xweser dixwwaze li gorî paradîgmaya Neteweya Demokratîk pergalekê dayne. |
| Pergal | 1. Awa û şêweyê kirin û meşandina karekî. Sîstem, nîzam. 2. Amûr, alav. 3. Biserûberî, birêkûpêkî |

# `JIN JIYAN AZADÎ` pergala desthiltdaran hejand



Bêrîvan Yûnis diyar kir ku armanca hedefgirtina jinan, têkbirina îradeya civakê ye û got, dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` wê bibe bingeha azadiya jinan li tevayiya cîhanê.***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1005 | 16-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# KOÇBERÎ XIZMETKIRINA ŞERÊ TAYBET E

Dijmin û sîxur ji bo derbekirina tecrubeya Rêveberiya Xweser kêliyekî jî ranwestin, vê carê plana wan teşwîqkirina ciwanan li ser koçberiya li derveyî welat e. Armanca wan ruhê têkçûyînê geş bikin û têgînên nerast ên koçberiyê li ser ferd, civak û malbatan belav bikin. Di encamê de enerjiyên mirovan xerc bikin, malbatan belav bikin û wan di siyasetên tevlêbûna li civakên nû winda bikin.



## Dr. Savary: Delîla herî mezin ev e ku Akar mikur hat ku gaz bi kar anîne

Artêşa Tirk a dagirker li Başûrê Kurdistanê çekên kîmyewî bi kar anîbû. Dr. Beppe Savary jî di nav wê komê de bû ku wan derbarê bikaranîna çekên kîmyewî raporek amade kiribûn. Savary got "Delîla herî mezin ev e ku Akar mikur hat ku gaz bi kar anîne." ***R-5***

## `Êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên ser Kurdistanê têkçûna siyaseta wê eşkere dike`

Roşîn Mûsa diyar kir ku êrişên dewleta Tirk ya dagirker tevayiya Kurdan dike hedef û get, bila kes xwe nexapîne, dewleta Tirk dijminê tevayiya Kurdan û eger qadên gerîla dagîr bike wê kurdan qir bike. ***R-4***

## Projeya çeksazkirina amûrên şaredariyan yên têkçûyî



Rêvebera Projeya çeksazkirina amûrên têkçûyî Silava Tahir da zanîn ku projeya çeksazkirna amûran projeyeke mezin û serkeftî bû, ji bo xizmetguzariya herêmê jî pir bi sûde. Herwiha got, Emê hewl bidin projeyê berdewam bikin û projeyên bi vî rengî zêde bikin. ***R-6***

## Mihrecana Osman Sebrî ya Wêjeyê ji bo nivîskaran derfetê peyda dike





Bi boneya bîranîna nivîskar Osman Sebrî, bi serpereştiya Destya Çandê ya Herêma Cizîrê û Bîroya Wêjeyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê, Şeşemîn Mihrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê li bajarê Qamişlo hat lidarxistin. ***R-7***



Farûk Sakik
**DAIŞ û Erdogan**
*R-4*



Memed Serdar
**Pergala dewlet dijî hemû gelan e**
*R-5*



Sîpan Şînda
**Sansûr**
*R-7*

# `JIN JIYAN AZADÎ` pergala desthiltdaran hejand

Bêrîvan Yûnis diyar kir ku armanca hedefgirtina jinan, têkbirina îradeya civakê ye û got, dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` wê bibe bingeha azadiya jinan li tevayiya cîhanê.

**Navenda Nûçeyan / Qamişlo**

Di 14'ê Îlonê de Jîna Emînî (22), piştî polîsên exlaqê yên Îranê bi hinceta laçika xwe bi awayekî rast nepêça ye, girtin û bi awayekî hovane îşkence lê kirin, di encamê de gihaşt asta şehadetê. Dema ev sûcê hovane pêk hat, xwepêşandanên girseyî yên şermezarkirinê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê hatin lidarxistin û piştre li bajar û herêmên Îranê Jî belav bûn. Ev xwepêşandan bi pêşengiya jin dest pê kir. Wek her car hêzên Îranê bi hemû rêbazên çewisîner li hember van xwepêşandanan sekinîn û di encamê de, li gorî raporên çapemeniyê bi deha kesî şehîd bûn. Tevî binçavkirin, girtin û êrişa leşker û polîsan, gel kolanan bernade û her ku diçe xwepêşandan firehtir dibin.

Li ser pêşengiya jina kurd ji xwepêşandanên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê endama Meclisa Giştî ya Kongra Star Bêrîvan Yûnis ji me re axivî.

Bêrîvan Yûnis diyar kir ku armanca rêjîma Îranê ji hedefgirtina jinê têkbirian îradeya civakê ye û wiha got: "Rêjîma Îranê bi bihaneyên cûda jinan dikuje û işkenceyan li wan dike. Armanca wê ya sereke têkbirina îradeya civakê ye. Hedefgirtina jin û kesên azadîxwaz, vedigere hişmendiya Rêjîma îranê ya dewletbûnê û tekez dike ku dewletîbûn di sîstema Îranê de gelekî Kure bûye. Li Îranê rewş gihiştibû astekê ku dema gel dixwest xwepêşandanan bike, pir hisab dikir. Ji ber ku rê û rêbazên Kuştin û işkencekirinê ji demên desthilatdareiya Sefewiyan heta niha bênavber dewam dike. Tu carî em Zeyneb Celaliyan jibîr nakin, çawa di zindanê de cavên wê kur bûn û ti raghandinê cîhanê ev sûcê li dij mirovî şînber nekir û ji bo raya giştî dernexist holê."

**`Bi hiceta olperestiyê nirxên mirovaiyê têk dibin`**

Bêrîvan Yûnis da xuyakirin ku hişmendiya dewletbûyîn di sîstema Îranê de kur bûye û wiha dirêjî da axaftinê xwe: "Bingeha hişmendiya dewletîbûn li ser koletiya jin û serdestiya zilam ava bûye. Mînaka herî ber bi çav ji serdestiya zilam re, rêjîma Îranê ye û tevayiya rêjîmên Rojhilata navîne. Rêjîma Îranê bi hiceta olperestiyê, nirxên mirovan dike armanc, dixwaze jin, civak û gelên Îranê li gorî modêl û hişmendiya xwe birêve bibe û zagonên li gor berjewndiyên desthilatdariyê li ser her kesî ferz dike. "

**``JIN JIYAN AZADÎ` bû dirûşmeyeke cîhanê`**

Bêrîvan Yûnis da zanîn ku Jîna Emînî, yek ji qurbanên hişmendiya desthilatdaran û wiha got: "Jîna Emînî bû çirûska serhildanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê. Ew bû qurbaniya hişmendiya desthilatdar ya mêrê serdedest û bû çirûska berdewamiya şoreşa jin ya bakur û rojhiêatê Sûriyê. Dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` bû dirûşmeyeke cîhanê, JI Rojava dest pê kir û li cîhanê deng veda. Em dizanin ku berdêlên şoreş û sehildanan pir giranin, Îro bi sedan mirov di serhildanên Îranê de jiyana xwe ji dest dane û bi sedan hatine îşkencekirin û binçîavkirin. Serhildanên Îranê



sekneke li hemberî hişmendiya dewletê ye. Bêyî hilweşîna sîstema dewletîbûn, civak nikare azad bijî. Sîstema dewlet û demokrasî ne pêkane bi hev re bê meşandin. Tenê jin dikare pêşengiya têkoşîna têkbirina sîstema dewlet ya ku mêrsalar serdeste, bike û azadiya jin û civakê misoger bike."

***`Fikrê Rêber Apo xelasiya mirovayiyê ji koletî û bindestiyê ye`***

Bêrîvan Yûnis balkişand ser fikrê Rêber Apo yê bingeha zadiya jinê, û wiha got: "Tevî ku li cîhanê bi dehan rêxistin û tevgerên jinan hene, lê azadiya jinê baş nehatiya fehimkirin. Hêzên desthilatdar li gorî berjewendiyên xwe hin zagonên bi navê parastina jin bicihkiriye. Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê û belvkirina felsefeya Rêber Apo re, Azadiya jin û civakê pêş ket û li cîhanê belav bû. Fikrê Rêber Apo xelasiya mirovayiyê ji koletî û bindestiyê ye, herwiha ji bo jinan riya azadiyê ye. bi felsefeya Rêber Apo Jin dikare zincîrên koletiyê biqetîne, kefenê mirinê biçrîne û bi azadî bijî. Netenê ji bo jin, fikr û felsefeya Rêber Apo xelasiya gelên azadîxwaz e."

Endama Meclisa Giştî ya Kongra Star Bêrîvan Yûnis diyar kir ku dirûşmeya JIN JIYAN AZADÎ wê bibe bingeha azadiya jin li tevayiya cîhanê û axaftina xwe wiha qedand: "Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi saya fikrê Rêbertî ji tevayiya cîanê re bû mînaka jiyana hevbeş ya gelan. Dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` ji destpêka şoreşa Rojava ve hat bilindkirin û wê dewam bike. Ji jinê Rojhilatê Kurdistan û Îranê tê xwestin ku xwe birêxistin bikin û têkoşîna azadiyê dewam bikin."

# Ji bo penceşêra pêsîrê semînerên hişyariyê tên dayîn

**Di tevahiya meha Cotmehê de, bi armanca agahdarkirina jinan ji metirsiya penceşêra pêsîrê li bajarê Kobanê, semînerên hişyariyê tên dayîn.**

Ji bo hişyarkirina penceşêra pêsîrê û pêşîlêgirtina wê her sal li tevahî cîhanê meha Cotmehê weke meha têkoşîna li dijî penceşêra pêsîrê tê pêşwazîkirin. Meha Cotmehê ya ku weke Cotmeha pembe jî tê zanîn yekem car bi armaca têkoşîna li dijî penceşêra pêsîrê di sala 1958'an de ji aliyê Civaka Penceşêrê ya Amerîkî û kompaniya dermanxaneyê Astra Zeneca ve dest pê kir. Ji bo perwerdekirina jinan li ser pêwîstiya naskirina zû ya penceşêra pêsîrê, Weqfa Jin a Azad li bajarê Kobanê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li ser bingehê pengava ku ji bo pêşîlêgirtina penceşêra pêsîrê daye destpêkirin bi armanca agahdarkirina jinan li ser vê nexweşiyê, semînerek lidar xist.

Der barê kampanyayê de, endama Desteya Tenduristiyê ya Weqfa Jinan Talîn Buşra got: "Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hemleya têkoşîna li dijî penceşêra pêsîrê ji bajarê Qamişlo û îro li bajarê Kobanî dest pê kir, di nava mehê de berdewam dike û wê hefteyê du caran semîner bên dayîn." Her wiha got, "Kampanyaya me bi dayîna waneyan li komîn û meclîsan dest pê kir, piştre derbasî gund û bajarokên kantona Kobanî bûn."

Talîn Buşra da zanîn ku di sala 2022'an de li tevahî cîhanê 685 hezar jin ji ber penceşêra pêsîrê jiyana xwe jides dane û wiha domand: "Armanca me ji dayîna van semîneran ew e ku em bigihêjin hemû jinan da ku haya wan ji pêwîstiya naskirina zû ya penceşêra pêsîrê hebe. Ji ber ku hin jin ji metirsiya belavbûna penceşêra pêsîrê nezan in û guh nadin muayeneyên demkî yên pêwîst ji bo pêşîgirtina wê."

Talîn Buşra amaje bi wê yekê jî kir ku divê jin hay ji metirsiya nexweşiyên jinê yên hevbeş hebin.

Asya Mistefa ya yek ji jinên ku bi kampanyayê re têkilî danî, got: "Min tiştên ku di dema semînerên



li ser penceşêra pêsîrê de hatin pêşkêş kirin, guhdar kir ku ez li ser giraniya vê nexweşiyê, çawaniya dermankirina wê û hewcedariya muayeneya periyodîk ji hêla bijîjkek pispor ve ne haydar bûm."

Asya Mistefa da zanîn ku niha ew bi rêya van semîneran ji vê nexweşiyê haydar e û wiha domand: "Niha der barê penceşêra pêsîrê de, ku pir bandorê li jinan dike, xwedî ramanek zelal im. Bi rêya vê gotara dewlemend a ramanên ku ji me daxwaz dikin ku em vê nexweşiyê paşguh nekin û divê hemû jin xwe ji nexweşiyên hevpar ên bi vê rengê biparêzin. Ez hêvî dikim ku Weqfa Jin a Azad ji bo bigihêje hemû jinên gund û bajarokan van semînerên xwe yên li ser vê bingehê zêdetir bikin."

***JINHA***

# Cenazeyê Akarselê bi dirûşma 'Jin jiyan azadî' hat veşartin

**Cenazeyê endama Lêkolînên Jineolojiyê Nagîhan Akarsel li ser milên jinan bi dirûşma "Jin jiyan azadî" hat veşartin.**

Endama Navenda Lêkolînên Jineolojiyê, akademîsyen û rojnameger Nagîhan Akarsel di 4'ê Cotmehê de li bajarê Silêmaniye yê Herêma Federal a Kurdistanê di encama êrîşeke sûîqestê de hat qetilkirin. Cenazeyê Akarsel îro 13-10-2022 di danê sibehê de anîn Nexweşxaneya Bajêr a Konyayê. Malbata Akarsel, piştî kar û barên otopsiyê cenaze wergirt û anîn gundê Golyazi (Xelîkan) ê Cîhanbeylî yê Konyayê ku li wir ji dayik bûye. Cenaze, bi tililiyên jinan hat pêşwazîkirin û li ser jinên milên jinan birin goristana gund.

**'ÊM Ê TÊKOŞÎNA NAGÎHANÊ BIDOMÎNIN'**

Di dema veşartina cenazeyê de leşkeran hewl dan ku nehêlin wêneyên Akarsel bên rakirin lê jinan li ber xwe dan û bi wêneyên Akarsel meşiyan. Di dema meşê de



dovîza "Jin jiyan azadî" hat vekirin, girseyê dirûşm berz kirin û ber bi goristanê ve çû. Di dema veşartina Akarsel de Berdevka Meclîsa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Ayşe Acar Başaran axivî û wiha got: "Nagîhan, em tevek in. Dibe ku Nagîhan qetil kiribin. Lê belê weke rêhevalên wê, em ê mîrasa wê dewr bigirin û heta dawiyê jî vê têkoşînê bidomînin."

Tevî dorpêç û astengkirinên leşkeran jî wecîbeyên olî hatin kirin û cenazeyê Akarsel bi dirûşma "Jin jiyan azadî" hat veşartin. Jinan, qurnefîl û şalên mor danîn ser gora Akarsel û piştre jî derbasî mala wan bûn.

Malbata Akarsel dê sersaxiyan li mala xwe qebûl dike.

***ANF***



# Mihrecana Osman Sebrî ya Wêjeyê ji bo nivîskaran derfetê peyda dike

Bi boneya bîranîna nivîskar Osman Sebrî, bi serpereştiya Destya Çandê ya Herêma Cizîrê û Bîroya Wêjeyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê, Şeşemîn Mihrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê li bajarê Qamişlo hat lidarxistin.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Nivîskar û helbestvanê Kurd Osman Sebrî di sala 1905'an de li gundê Narancî yê bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye û di sala 1993'an de koça dawî kiriye. Helbestvan, zimanzan, wêjevan û siyasetmedarekî Kurd bû û xwedî dîrokeke dûr û dirêj di xizmeta gelê Kurd de bû.

Ji bo bîranîna Osman Sebrî, Rêveberiya Çandê li Herêma Cezîrê û Komîteya Wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê festîvala wêjeyê ya bi navê Osman Sebrî di şeşemîn rûniştina xwe ya salane de li bajar Qamişlo li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê li darxist.

**Çalakiyên Mihrcanê**

Endama Komîteya Amadekar ya Mihrîcana



Osman Sebrî ya Wêjeyê Botan Hoşê, ji rojnama me re behsa girîngiya mihrîcanê ya ku her sal tê lidarxistin kir û wiha got; "Armanca lidarxsitna mihrîcanê, piştgiriya nivîskar û helbestvana ye. Ta ku di demên pêş de bibin eynika çand û wêjeya civaka xwe."

Botan, teqez ki ku tevlîbûna jinan ya îsal ji sedî 50 ji salên borî, zêdetir bûye û wiha got: "Jin bi pêşkêşkirina roman û nivîsên xwe yê balkêş, festîvalê dixemilînin û bi rengê xwe yê xweşk li mihrîcanê xweştir dikin."

Botan bal kişand ser bernameya çalakiyên festîvalê yên îsal: "Bernameya çalakiyên şeşemîn ya mihrîcana Osman Sebrî wê, pêşkêşkirina selevîzyonê, beşên mûzîkê, xwendina çîrokan û şevbuhêrkên helbestan bû. Herî dawî xelatkirina serketiyên nivîskarên pêşbirka festîvalê di warin ragihandin."

Endama komîteya amadekar ya Mihrîcana Osman Sebrî ya wêjeyê Botan Hoşê di dawiya axaftina xwe de serkeftin ji hemû nivîskaran re xwest û wiha got; "Mihrîcanê bi vî rengî pir girîn û pêwîst e, lewra çalakiyên çandî, çand û huner civakê pêşdixe û diparêze."

**`Roman kurtahiya jiyana civakê ya`**

Nivîskar Ciwan Silo ku xelata yekê ya festîvala par li ser çîroka xwe ya bi navê



"Xemgîniya yekî mirî" wergirtibû, îsal jî bi çîrokeke nû, tevlî pîbirka mihrîcanê dibe. Ciwan li ser nêrîna xwe ya derbarê hilbijartina romanê ya îsal de, wiha got: "Roman dikare zêdetir hestên nivîskar ragihîne. Ji bilî wê jî dikare pirsgirêk û kirîza ku civak tê de derbas dibin, bi kurtayî bîne ziman."

Ciwan Silo herwiha bal kişand ser girîngiya Festîvala Osman Sebrî û wiha got: "Ev mihrîcan di şeş salên xwe de ji bo me wek nivîskaran, derfetek e ku em çanda pirtûkxaneya kurdî li rojava, pêştir bixin. Herwiha ji bo pêşketina me jî xwedî roleke girîng e."

**Pênûsa jinê di mihrîcanê de**

Helbestvan û nivîskar ya Wefai Başa ku ji pêkhateya Çerkez e diyar kir ku, bi saya



fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Oalan, jin di hemû qadên jiyanê de, bû xwedî roleke girîng. Wefai wiha got: "Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê di hemû qadên jiyanê de cih û hebûna xwe îsbat kirin. Îro jî em dibînin ku ew di Mihrîcana Wêjeyî de jî, dibiriqe. Ji bo parastina gel, jinên şervan di çeparan de li be xwe didin û jinên nivîskar jî di qada wêjeyî de, parastina çanda civaka xwwe dike. Jin bi saya ramanên Rêber Apo û bi têkoşîna xwe dikeve dîrokê."

**Bi helbesta xwe bang dike**

Wafai li ser sedema beşdarbûna xwe ya mihrîcanê wiha got; "Rêber Abdullah Ocalan zincîra koletiya ku li benda jinan bû şikand û wê ji zindana bêheqiyê rozgar kir. Bi fikir û felsfeya Rêberiyê, jin rabû ser piyan û şerê





hemû êrişkeran kir. Herwiha bû pêşenga Şoreşê bû, em jî wek helbestvan, wêneyê şoreşa ku bi pêşengiya jinan destpê kir, bi nivisên xwe, bedewtir dikin."

Wafai Başa bi helbesta xwe bang li jinan kir ku rabin ser piya û wiha got: "Rabe Çerkeza, neviya Satelît, rabe Kurdiyê neviya Kawê Hesinkar, rabe ser xwe Ermeniya ku komkujiyên herî hov ser we dehat, û ti Xirîstiyê, rabe Îsa bi evîna mirovatiyê bawer kir, rabe Ereba neviya Zenobiya, ez jî spasiya jina Tirkmen dikim ku zincîrên koletiyê şikandiye, ev gotin ji helbestvana Çerkez ya ku ji projeya neteweya demokratîk bawere."

Helbestvan Wefai Başa axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Divê jin di qada wêjeyî de, xwedî pênûseke taybet be. Divê jin bi xwe serkeftinên xwe binivisne û biprêze, lewra jin kilîta azadiyê ye."

Mihrîcan Wêje ya 6`an ya Osman Sebrî, roja pêncşemê 13.10.2022`an bi pêşkêşkirina koma hunerê, strana, silvizyonê û belavkirina xelatan, ji bo nivîskarên her sî beşan (kurdî, erebî û suryanî) bi dawî bû. Li ser asta yekê di zimanê kurdî de, Kamûran Smo. Di zimanê erebî de li ser asta yekê Ebd El-Cebar Hebîb, asta duduyan Ciwan Silo, asta sisiyan Senai Hacî.

# Zarokên kampa Waşokanî bi şanoyê êşa xwe pêşkêş dikin

**Rojbîn Zagros/Hesekê**

**Bi destanên zarokatî û wêneyên ku di hişên wan de asê mane, zarokên kampa Wşokanî behsa xwe dikin û rastiya êşa xwe bi rêya şanoyê derdixînin. Herwiha hurgiliyên koçberiyê yên ku di jiyana wan de derbas bûne, pêşkêş dikin.**

Zarokên Kampa waşokanî yên ku di êrişên ser bajarê Serê Kaniyê de bûn şahidê tevayiya bûyer û kiryarên hovavîtiyê, heta niha ev bûyer ji bîra wan naçe û bi riya şanoyê êşa xwe derdixînin. Sê sal di ser dagîrkirina bajarê wan de derbas dibin, lê hê jî kêliyên topbaranê û wêneyên şewatê, kuştinê, xwînê, parçeyên laş yên ku li erdê belav bûyîn, ji ber çavên wan neçûne.

Zarokan piştî ku ji bajarê xwe derketin û dûrî mal û rojên xwe yên xweş ketin, herwiha dûrî zarokatiya xwe jî ketin, xwestin tevayiya bûyerên ku di jiyana wan de derbas bûne, li kampê bi şanoyê bûyerên bi êş temsîl bikin.

Derbarê şanoyê de zarokên kampa Waşokanî yên ku tevlî şanoyê bûne ji me re axivîn û dan zanîn ku ew li Navenda Waşokanî ya Çand û Hunerê ya li kampê şanoya xwe pêşkêş dikin.

**Bûyerên êşa xwe bi riya şanoyê pêşkêş dikin**

Zaroka bi nav Beyan Mihemed Hemîd ya 13 salî ku di şanoyê de amade dibe da xuyakirin ku ew û şeş hevalên xwe bi hev re şanoyê pêşkê dikin û axaftina xwe wiha domand: "Ji ber ku ez pir ji şano hez dikin, xwesteka min bû ku ez tevêlî şano bibin û di paşrojê de bibn lîstokvaneke şano ya xurt. Xwesteka min li kampê bi cih bû. Piştî ku em ji bajarê xwe dûr ketin û li kampa Waşokanî bi cih bûn, me xwest ku em bûyer û rojên herî bi êş bikin şano û pêşkêşî her kesî bikin. lewra ev bûyer ji bîra me nacin û weke êşeke bê dawî ne. Ji bo wê jî niha ez û hevalên xwe bi hev re vê şanoyê pêşkêş dikin."



Beyan diyar kir ku di destpêkê de ew û hevalên xwe di binê konê xwe de kom dibûn û şanoyê pêşkêş dikir. Herwiha got, rojbiroj me asta xwe bi pêş dixist. Ji bo wê jî me ji Navenda Çand û Hunerê xwest ku em tevlî beşê şano bibin û şanoya pêşkêş bikin.

Beyan da zanîn ku ew rola dê di şanoyê de digre û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Rola dê di şanoyê de pir girêng e û bi êş e. Ji ber wê jî min xwest xihê wê bigrim. Di şanoyê de ez didim xuyakirin çawa ku dê di topbaranê de şehîd dike û zarokên wê li du wê dimînin. Hevalên min jî her yek cihekî di şanoyê de digre."

Beyan Mihemed Hemîd di dawiya axaftina xwe de got, em bihêvîme em vegerin bajarê xwe, da ku em şanoya xwe li bajarê xwe berdewam bikin û şanoyeke nû li ser kêfxweşiya vegerê pêşkêş bikin.

**Şano ji sê beşan pêk tê**

Zaroka bi navê Fereh Elî Remedan ku ew jî tevlî şanoyê dibe bîr xist ku şanoya wan li ser sê beşan pêk tê û wiha pê da çû: "Beşê yekê li ser rojên xweş yên ku me li bajarê xwe qedandiye. Beşa duduyan jî behsa kêliyên topbaranê û koşberariya me dike, herwiha beşa dawî jî behsa rewşa me ya li kampê dike."

**`Em êş û bûyerên xwe vedigerînin`**

Fereh Elî Remedan di dawiya de got, dema em şanoyê pêşkêş dikin hêsirê çavên me weke baranê dibarin. Lewra em êş û bûyerên xwe yên berê vedigerînin.

## Sansûr



Sîpan Şînda

Di roja me ya hemdem û pêşketî de, sansûr bûye bela serê gelek nivîskar, rojnamevan, rojname, weşanxane, akademîsyen û hwd. Bi taybetî ji di qada medya ya nivîskî û dîmenî de ev gotin bûye weke keraneyeke giran û li raseyî serê wan sekiniye. Kî ji "rêzê" derbikeve gurm li serê wan dikeve. Bi taybetî ji di van salên dawî de sansûr li ser çapemeniyê zêde bûye û gelek desthilatdarî dixwazin bi rêya sansûrê çapemeniyê bi taybetî ji çapemeniya dîjîtal bêxe bin kontrola xwe. Ji ber ku îro înternet bûye qada çapemeniyê ya serekeyî.

Peyva sansûrê ji gotina Frensizî censure ê tê û ew jî ji peyva censura ya Latînî tê. Di salên 1530'ê de sansûr di wateya "nirxandin", "qîmet diyarkirin" û "darizandin"ê de; di salên 1580 yê de di wateya "darizandin", "hikumkirinê" de; paşê di wateya "rexna nerênî", "kêmasî dîtin" û "hikum dayîn"ê de hatiye bikaranîn. Di Latînî de ev peyv hişktire û jiber wê wateya "darizîner" û "exlaqperestê hişk" de hatiye şixwilandin. Ji salên 1640 ê û pêve ev peyv ji bo kesên ku "pirtûk, lehîstûk û weşanên din ji aliyê exlaqî ve kontrol dikirin" hatiye şixwilandin.

Di sedsala 19'an de ev peyv di Ingilîzî de ji bo sîxurên dewletê yên ku "pêşiyê" li axaftinên siyasî û weşanên ji bo dewletê "nebaş" bigirine hatiye bikaranîn. Bi vî hawî peyva sansûrê êdî bûye neyarê axaftin, nivîsandin û pênûsa azad. Îro mirov Ewropa û Emerîka jê derbixe, pênûsa azad li seranserê cîhanê bi sansûrê re rûbirû dimîne û gelek rojnamevan, nivîskar û weşanger ji ber pênûs û weşanên xwe têne darizandin, têne girtin û bi salan di zîndanan de dimînine. Her desthilatdarî dixwaze rojname, kovar, malperen înternetê û mediya civakî bêxe di bin "emrê" xwe de û tişta li gorî dilê wan bê nivîsandin û ya ne li gorî dilê wan jî be ji nedîtî ve tê dîtin. Tehmûla desthilatdariyên hişk, otorîter û dictator ji rexneyan re, xeletî anîn zimên re nîne. Dibêjine divê her tişt li gorî bawerî, bîrdozî û felsefeya me be. Dema hinek ji "rêzê" derbikevin jî, hema cihde nivîsên wan yan na weşînin, yan jî li gorî dilê xwe didine "sererastkirin" û paşê destûrê didine bê weşandin.

Gelek caran me dîtiye ku rûpelên rojnameyan reş, nîvreş hatîn weşandin û mohra "sansûrê" lê hatî dayîn. Ev yek bi taybetî ji aliyê desthilatdarên xwediyê hizrekê tekane û pirhizirînê, fikir û ramanên cihê napejirînin ve tête kirin. Mixabin bîrdozî û baweriya desthilatdaran bûye bela serê pênûsên azad û hizir û ramanên azad. Lê belê rastiyek heye ku pirhizirîn, fikir û ramanên cuda her tim civakê pêşve dibe û desthilatdaran ji ronî dike. Lê mixabin desthilatdar berûvajî vê difikirin û ew dibêjin, ne li "gorî" me ye. Ne li "gorî" wa tê, ji ber ku peyvên ji devê wan derdikevin, nehatîne nivîsandin. Li gorî wan, divê nivîskar ya dilê wan bêje û tişta di serê wan de dibûre binivîse. Dema ew bixwînin divê bêjin, eve te tiştê min dixwest aniye ziman. Lê belê îro derfetên nivîsandinê û weşandinê gelekî zêde bûne û sansûrkar pêre nagihin hemûyan kontrol bikin. Yên sansorê dikin, jibîr nekin, pênûsa azad ji bo we ye jî.

# Projeya çeksazkirina amûrên şaredariyan yên têkçûyî

Rêvebera Projeya çeksazkirina amûrên têkçûyî Silava Tahir da zanîn ku projeya çeksazkirna amûran projeyeke mezin û serkeftî bû, ji bo xizmetguzariya herêmê jî pir bi sûde. Herwiha got, Emê hewl bidin projeyê berdewam bikin û projeyên bi vî rengî zêde bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Projeyên ku ji aliyê Desteya Rêveberiya Xwecihî û Jîngehê ve tên pêkanîn, di xizmeta gelê herêmê û pêşxistina xizmetguzariyê de encameke baş didin. Îsal Desteyê gelek projeyên mezin û piçûk li herêmê pêk anî. Yek ji projeyên mezin ku di dema dawî de pêk hat çeksazkirina amûrên têkçûyê û şikestî bû, ku bi hevkariya Bernameya Firat Plas amûrên şaredariyê yên girêdayî paqijiyê û serfa sihî li ser asta herêma Cizîrê hatin çeksazkirin. Projeya serastkirina mekanîzmayên şikestî li ser asta herêma Cezîrê pêk anî.

Projeyê 16`ê heyva Hizêranê dest pê kiribû û ser sê heyv û nîvan dewam kir. Tê de 120 amûrên wek (Bobgad û Tirêkis) ku ji 57 şaredariyên herêma Cizîrê hatibûn hilbijartin hatin çeksazkirin. Herwiha wê di dema bê de berdewamiya projeyê bê kirin, da ku amûrên xirab yên mayîn jî werin çeksazkirin.

Derbarê pêkanîna projeyê û armanca wê rêvebera Projeya çeksazkirina amûrên têkçûyî li ser asta herêma Cizîrê Silava Tahir ji me re axivî û da zanîn ku cara yekê projeyeke bi vî rengî li ser asta herêma Cizîrê tê pêkanîn.

**`Armanc çeksazkirina amûrên Têkçûyî ye`**

Silava diyar kir ku armanca projeyê ew e ku tevayiya amûrên têkçûyî werin çeksazkirin û bikevin xizmetê de û axaftina xwe wiha domand: "Ji ber ku gelek amûr û makîneyên şaredariyên herêma Cizîrê xirab bibûn me pêwîstî bi projeyekê wisa dît. Piraniya amûrên girêdayî şaredariyên me xirab e bûbûn



û derfetên me jî zêde nebûn ku em wan çeksaz bikin. Ji bo wê me bi hevkariya bernameya Firat Plas projeya xwe ya çeksazkirina amûran pêk anî. Me tevayiya amûrên xirab lêkolîn kir û jimara wan ragihand bernameyê. Di encama lêkolînê de diyar bû ku 300 amûrên me yên xirab hene. Lê di projeyê de 120 amûr tenê hatin çeksazkirin. Lewra pereyên ku ji bo projeyê hatibû hilbijartin têra tevayiya amûran nekir."

Silava derbarê amûrên ku hatine çeksazkirin, destnîşan kir ku wan girîngî da amûrê paqijiyê û serf sihî û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji be ku hertim di kar û xebatê de, herwiha di pêkanîna projeyên xwe de, me zehmetî di milê kêmbûna amûran de didît, me hewl da em van amûran çeksaz bikin. Da ku bikevin xizmetê de."

**`Di encama êrişên dagîrkeriyê de gelek amûr têkçûn`**

Silava Tahir diyar kir ku piraniya amûrên wan di encama êrişên dewleta tirkî ya dagîrker de xirabe bûbûn û wiha pê da çû: "Amûrên şaredariya Til Temir, Dirbêsiyê û Zirgan ew yên herêî xirabe bûn, lewra êriş li ser van bajaran zêde ye û di encama êrişan de zirar pir li milê xizmetguzariyê hat kirin. Herwiha pêwîstiya van bajaran bi amûran jî heye. Ji bo me hewl da ku amûrên van bajaran bi giştî çeksaz bikin."

**`Emê projeyê berdewam bikin`**

Silava da zanîn ku pereyên ji bo projeyê hatibûn veqetandin têra çeksazkirina 300 amûrî edikir û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Projeya me mezin û berfirehe. Lê ji ber ku pere têrê nedikir me 120 amûr çeksaz kirin. Amûrên mayîn jî di dema bê de emê çareke din dest bi projeyê bikin û berdewamiya çeksazkirina wan bikin. Ji bo wê jî niha em li benda erêkirina bernameya Firatin, da ku em projeyê sê heyvên din dirêj bikin û dest bi çeksazkirina amûrên mayîn bikin."

Silava da xuyakirin ku amûr li herdû rawesgehên erebeyan ya Qamişlo û Hesekê hatin çeksazkirin û got, piştî ku çeksazkirin bi dawî bû, tevayiya amûran li şaredariyan hetin belavkirin.

**Zehmetî û astengiyên di projeyê de hatin dîtin**

Silava behsa zehmetiyên ku bi wan re derbas dibin kir û wiha got: "Em herî



zêde zehmetiyan di milê peydekirina parçeyên amûran de dibînin. Lewra piraniya amûrên me yên endezyarî û elektrîkî ne û parçeyên wan jî li pîşesaziya Qamişlo peyda nabin. Ji bo wê jî em neçar bûn ku parçeyan ji milê Heleb, Minbic û başûrê Kurdistanê peyda bikin. Ev jî pereyên zêde û demê me dibir."

**`Projeyeke mezin û serkeftî bû`**

Rêvebera Projeya çeksazkirina amûrên têkçûyî li ser asta herêma Cizîrê Silava Tahir di dawiya axaftiana xwe de got, projeyeya çeksazkirna amûran projeyeke mezin serkeftî bû, herwiha ji bo xizmetguzariya herêmê jî pir bi sûde. Emê hewl bidin projeyê çareke din berdewam bikin û projeyên bi vî rengî zêde bikin. da ku xizmetguzarî li herêmê hê zêdetir bi pêş bikeve.

# Wergirtina pembo ji cotkaran dewam dike

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

**Cîgirê Desteya Çandinî û Avdaniya ya bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kir ku rojane nezî 2 hezar Ton pembo ji cotkaran tê wergirtin û got, girtina ava Firatê ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve bû sedema sereke ya lawazbûna berhemê pembo.**

Pembo, yek ji berhemên çandiniyê yên stratejîk li Sûriyê ye û ji ber giringiya berhemî vê di cîhanê de navê 'Zêrê Spî ' lê hatiye kirin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber gelek sedeman, bandoreke neyînî li çandina pembo bû. Lê ya herî zêde bandor lê kirî, kêmkirina rêjeya ava Firatê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker bû. Wekî ku tê zanîn jî pembo yek ji wan berheman ku bi kêmanî di salê de pêwîstiya wê bi 12 avdanan heye, da ku berhemê wê derkeve.

Şîrketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê ya girêdayî Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di 15'ê Îlonê de, dest bi wergirtina berhemên pembû yên îsal kir û ji bo her kîloya pembo 4 hezar û 300 lîreyên Sûrî hat destnîşan kirin. Wergirtina pembo ji



cotkaran, li gorî mekanîzmeyekê pêk tê ku cotkar bê astengî berhemên xwe teslîm bikin. Herwiha tedbîrên wergirtin, bi rêya wergirtina belgeyekê ji navendên çandinî ya herêmê û wêneyeke nasnameya kesayetî tên girtin. Xebatên wergirtine pembo ji cotkaran, piştî çavdêrkirina çiqasa berhem, lêkolînkirina nimûneyê wê ji aliyê pisporên navenda wergirtinê ve pêk tê, ji ber ku biha li gorî "Qalîte, şilbûn û paqijiyê" tê guhertin.

Derbarê mekanîzmaya wergirtina pembo ji cotkaran, Cîgirê Desteya Çandinî û Avdaniyê li bakur û rojhilatê Sûriyê Ehmed Yûnis ji me re axivî.

**'Rojane nêzî 200 ton pembo tê wergirtin'**

Yûnis Ehmed diyar kir ku di vê salê de, wergirtina pembû ji cotkaran di 5'ê Îlonê de dest pê kir û wiha got: "Rêveberiya Xweser ji bo wergirtina pembo ji cotkaran, li bakur û rojhilatê Sûriyê 3 navend nîşan kirin (Navenda Heskê ji bo cotkarê Herêma Cizîrê, Navenda Seba Kîlo li gundewarê Dêrazorê ji bo cotkarên herêma Dêrazorê û navenda Reqayê ji bo cotkarên herêma Firatê ). Navenda hesekê rojanê nêzî 100 Ton pembo û Navenda Reqayê jî nêzî 900 Ton pembo ji cotkaran werdigre. Lê qaseya pembo ya ku ji Navenda Seba Kîlo ya Dêrazorê werdigre, pir kême."

Yunus da xuyakirin ku pemboyê heta niha hatiye wergirtin qalîteya wê başe û wiha got: "Qalîteya pembûyê ku ji destpêkê heta îro ji cotkaran hatiye wergirtin, pir başe. Ji ber ku heta niha hilbirîna yekem tê çinîn. Piştî 15'ê Cotmehê û dema ku hilbirîna yekem bidawî bibe wê qalîteya pêmbo kêm bibe.

**'Zeviyên ku isal bi pembo hatine çandin zêdeyî 500 hezar donimî ye'**

Yûnis da zanîn ku Rêveberiya Çandinî û Avdaniyê, di çarçoveya planeke ku 5 salan dirêj bike, dest bi kirîna pembo kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: " Pembo jî wekî genim, ceh û tevaiya berhemên çandiniyê di plansaziya salane ya çandiniyê de, cih digire. Desteya Çandinî û Avdaniyê li gor derfetên xwe, pêdiviyên çandinya pembo radestî cotkaran dike. Herwiha madeya feromon li cotkaran belav dike, erka madeya feromon kêmkirina bikaranîna dermanên kîmyawî û ji hole rakirina kurmê Qurnefîlê û Amerîkî, bêyî bikaranîna dermanên kîmyawî ye. Lê îsal hin pirsgirêk di belavkirina madeya mazotê de derket. Sedema wê jî, zêdebûna zeviyên çandiniya pembo yên ji derveyî plana çandiniyê bûn. Zeviyên ku îsal bi pembo hatine çandin, zêdeyî 500 hezar donimî ye. Di destpêkê de em rastî gelek pirsgirêkan hatin, lê îro me ji sedî 50 astengî û pirsgirêk derbas kirin."

**'Di pêşroje de wê alîkariya cotkaran bê dayîn'**



Cîgirê Desteya Çandinî û Avdaniyê li bakur û rojhilatê Sûriyê Ehmed Yûnis da zanîn ku pembo berhemeke stratîjîke û axaftina xwe wiha qedand: "Ji ber ku pembo berhemekî stratejîk e, rastî gelek pirsgirêkan tê. Rêveberiya Çandinî û Avdaniyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo derbaskirina astengan û çareserkirina pirsgirêkan û alîkariya cotkaran, gelek pirojeyan amade dike. Herwiha ji bo belavkirina mazot, tov û samadê, gelek plan hatine dayîn. Rêveberiya Çandinî û Avdaniyê, cureya tovê pembo ya bi navê 'Helebê 124' tecrube dike û wê piştî du salan, li ser cotkaran belav bike."



# Xwepêşandan didomin: Li Sine û Kirmaşan 3 kes hatin qetilkirin

Tevî ku li bajar kirine leşkergeh û li her cihî belav kirine, xwepêşandan û nerazîbûnên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê berdewam in. Şeva borî li Sine û Kirmaşanê ji aliyê hêzên Îranê ve 3 kes hatin qetilkirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê duh di roja 26'an de li bajarên Bokan, Sine, Seqiz, Mehabat, Kirmaşan, Bane, Merîwan, Kamîran, Îlam û çend navendên xwepêşandan û nerazîbûnan bi dirûşmeya, "Jin, Jiyan, Azadî' li dijî qetilkirina jina Kurd Jina Emînî berdewam kir.

Tevî ku hêzek leşkerî ya zêde li bajarên Rojhilatê Kurdistanê hatine bicihkirin û rasterast xwepêşanderan gulebaran dikin, lê xwepêşander li dijî hêzên Îranê li ber xwe didin û li dijî desthilatdariya Îranê dirûşmeyan berz dikin. Li gorî agahiyan, di xwepêşandanên duh de, li Kirmanê 2 kes û li Sine kesek ji aliyê hêzên Îranê ve hatin kuştin. Li Merîwanê jî ciwanek bi guleya çifteyê birîndar ku nêzî 120 saçma li laşê wî ketiye.

Li paytexta Îranê Tehranê duh jî xwepêşandan hebû. Parêzerên Tehranê bi dirûşmeya, "Jin, Jiyan, Azadî" daketin qadan. Polîsên Îranê bi gaza îsotê mûdaxeleyî parêzeran kir. Li kola Weliyesera Tehranê hêzên Îranê rasterast gule li xwepêşanderan barand.

Li bajarê Gewherdeşt, Kerec, Reşt, Esfehan, Bender Ebas, Mîraban, Hemedan û çend navendên din xwepêşadan û nerazîbûn hebûn.

Li gorî daneyên Rêxistina Mafê Mirovan ya Îranê heya niha herî kêm 201 kes ku 23 ji wan zarokin, ji aliyê hêzên Îranê ve hatine kuştin, bi sedan kes birîndar bûne û hezaran kes jî hatine binçavkirin. ***ROJNEWS***



# HPG: Sîxurê MÎT'ê Ozan Çîftçî hate cezakirin

**Navenda nûçeyan**

**HPG: Ajanê MÎT'ê nokerê dijmin Ozan Çîftçî ku hate tespîtkirin di şehadeta fermandarên me yên Eyaleta Serhedê de Evîndar, Eylem û Senar rola xwe heye, ji aliyê tîma me ya tolhildanê ya otonom ve hate cezakirin.**

Navenda Ragehendina Hêzên Parastina Gel HPG`ê bi daxuyaniyekê ragehand ku Ajanê MÎT'ê nokerê dijmin Ozan Çîftçî ji aliyê tîma wan ya tolhildanê ya otonom ve hate cezakirin.

HPG`ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku têkoşîna Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê ku ji Bakur heta Başûr li dijî artêşa Tirk a mêtinger û hevkarên wê tê kirin, bênavber dewam dike [ wiha got: "Hevrêyên me ku li tunel û çeperên şer berxwedana me ya dîrokî bi fedakariyeke mezin dewam dikin, di dîroka berxwedanê ya gelê me de rûpelekî nû vekirine, tîmên me yên bi tevger bi çalakiyên xurt derbên giran li dagirkeran dixin. Têkoşîna me ya bi feraseta 'ji sibe re dihêle, lê ti carî ji dagirker, xayin û nokeran re nahêlin' bi hilanîna tola şehîdên me yên nemir careke din nîşanî her kesî da ku hesabê her dilopa xwîna hevrêyên me wê bê pirsîn."

HPG`ê da xuyakirin ku di encama




çalakiyên hêzên wan de dagirkerek û sîxurek hatin cezakirin, dagirkerek jî bi giranî birîndar bû û wiha dewam kir: "Di heman demê de derb li çeperekê hate xistin. Artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 5 caran bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî, 3 caran bi balafirên şer, 30 carî jî bi helîkopteran, bi dehan carî bi obus, hawan, tank û çekên giran bombe kir."

**SÎXUR OZAN ÇÎFTÇÎ HATE CEZAKIRIN**

HPG`ê derbarê cezakirina endamê mîtê yê bi navê Ozan Çiftiçî wiha got: "Bûyera şehadeta fermandarên pêşeng ên Eyaleta Serhedê hevrêyên me Evîndar, Eylem û Senar ji aliyê hêzên me ve hate lêkolîn. Di encamê de hate tespîtkirin ku endamekî MÎT'ê yê bi navê Ozan Çîftçî di şehadeta hevrêyên me de bi roleke çalak rabûye. Nokoer Ozan Çîftçî ku sîxurekî MÎT'ê bû ji aliyê tîma me ya tolhildanê ya otonom ve hate cezakirin."

# Meclisa kantona Hesekê sûcê suîqastkirina Mihemed Bozan şermezar kir

**Navenda nûçeyan**

**Meclisa kantona Hesekê sûcê suîqastkirinê yê li dijî endamê meclisa navçeya Şedadê Mihemed Bozan ku şaneyên veşartî yên çeteyên DAIŞ'ê pêk aniye, şermezar kir.**

Şaneyên veşartî yên çeteyên DAIŞ'ê, dema endamê Komîteya Parastinê ya Meclisa Navçeya Şedadê û endamê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Mihemed Bozan vedigerî gundê xwe yê Elos, li pêş mala wî suîqast kir.

Têkildarî mijarê meclisa kantona Hesekê bi daxuyaniyek suîqastkirina endamê Komîteya Parastinê ya Meclisa Navçeya Şedadê û endamê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Mihemed Bozan, şermezar kir.

Meclisa kanntona Hesekê Diyr kir ku armanca terorê rijandina xwîna sivîlan e û wihha got: "Careke din terorê hevrêyê me hedef girt. Ew yek dijberiya eşkere ya li hember vîna gelê me û derbekirina pêkhateyên herêmê ye, her wiha nîşaneyeke zelal e ku armanca terorê xwînrijandina sivîlan e. Şaneyên terorê endamê meclisa navçeya Şedadê ya Meclisa kantona Hesekê Mihemed Hisên Bozan ku endamê Komîteya Parastinê ye, dema vedigerî mala xwe bi guleyan kir hedeft. Di encamê de şehîd bû."

Meclisa kanntona Hesekê da xuyakirin ku hedefgirtin, berdewama komployên li dijî gel, ewlehî, îstîqrar, jiyana hevbeş û li dijî projeya demokratîk e û wiha got: "Ew yek tolhilanîna têkçûyîna çeteyên DAIŞ'ê di Pêngava Mirovî û Ewlehiyê ya li kampa Holê de ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn û QSD'ê li dijî şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê pêk anîne.Em vê sûcê hovane şermezar dikin û civata navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan berprisiyar dibînin, ji ber li ser van sûcan bê deng in."

Meclisa kanntona Hesekê daxuyaniya xwe wiha qedand: "Em bang li civata navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan dikin ku dawî li êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bînin, sûcdaran muhasebe bikin, çareyekê ji dosyaya çeteyên DAIŞ'ê re deynin ku êdî li ser herêmê xeter e. Ji ber bidawîkirina xeteriya wan ne tenê li ser mile Hêzên Ewlekariya Hundirîn û QSD'ê ye.Xwîna şehîdên me badilhewa naçe, em ê li ser şopa şehîdên xwe bin û têkoşînê bilind bikin."

# `Êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên ser Kurdistanê têkçûna siyaseta wê eşkere dike`

Roşîn Mûsa diyar kir ku êrişên dewleta Tirk ya dagirker tevayiya Kurdan dike hedef û get, bila kes xwe nexapîne, dewleta Tirk dijminê tevayiya Kurdan û eger qadên gerîla dagîr bike wê kurdan qir bike.

**Mihmed Xanim/ Qamişlo**

Dewleta tirk ya dagirker bi salane ku tecrîdeke giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocelan dide meşand. Li gêleka tecrîdê şrekê dijwar li tevaiya qadên ku şervanên azadiya Kurdistanê û gelên azadîxwaz lê hene birêve dibe. Di demên dawî de Ji ber têkçûna artêşa wê, li ser destên gerîlayên azadiyê, dagîrkeriya tirk li dijî qadên gerelayan çekên kîmyawî û nokklerî bikar tîne. Dagirkerî li her derê kurdistanê têkoşerên Kurd dike armanc, ev jî bi hevkariya xayîn û sîxuran pêk tê.

Derbarê êriş û kiryarên dewleta tirk ya dagîrker yên li dijî gelê Kurd, endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa ji me re axivî.
Roşîn Mûsa diyar kir ku ji ber têkçûna siyaseta dewleta tirk wê êrişên xwe yên ser tevayiya Kurdistanê zêde kirine û wiha got: "Êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a li Başûrê Kurdistanê ne tenê hedefkirina partiyekê ye. Armanc dagirkirina hemû Kurdistanê ye. Divê li her derê destkeftiyên Kurdan bên parastin. Dewleta Tirk ne tenê PKK'ê dike hedef. Çiqas destkeftiyên li Başûr, Bakur, Rojava û Dîasporayê hene dike hedef. Dixwazin Impratoriya Osmanî ji nû ve vejîn bikin."

Roşîn da zanîn ku tecrîda li ser Rêber Apo tê meşandin û zêdebûna êrişên dagirkeriya tiurk yên ser Tevgera Azadiyê isbat dike ku siyaseta dewleta tirk ya dagirker tê diçe û wiha got: "Tecrîda giran ya ser Rêber Apo û zêdebûna êrişên dagîrkeriya tirk yên ser qadên gerîla iflasa siyaseta dewleta tirk eşkere dike. Ji ber ku atêşa tirk ya dagirker li hemberî berxwedana gerîla têk ndiçe, dagîrkerî li pêş çavên hikumeta Îraq, hikumeta başûrê Kurdistanê û tevayiya cîhanê çekên nokklerî û kîmyawî li dijî qadên gerîla bikar tîne. Tevî ku HPG`ê bi dîmenan êrişên dewleta tirk ya dagirker yên bi çekjên noklerî isbat kir, lê cîhan xwe bêdeng dike. Têkoşîna gerîla di asta herî jor de û derbeyên giran li dagirkeriyê dide. Ji her demê zêdetir pêwîstî bi çalakiyên Şermezarkirina kiryarên dewleta tirk ya dagirker heye."

Roşîn Mûsa da zanîn ku ji bo eşkerekirina kiryarên dewleta tirk ya dagirker, di vê demê de hiqûqnas



û rewşenbîran pir girîng û wiha got: "Pêwîste hiquqnas, rewşenbîr û tevaiya Kurd li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî xwepêşandana li dar bixin. çalakiyên civaka sivîl ji bo eşkerkirina sûcên dewleta tirk ya dagirker pir girînge. Hêzên navnetewyî perpiesyarên êrişên dewleta tirk yên ser Kurdan û tecrîda li ser Rêber Apo ne, Emê hisab ji wan jî bixwazin."

Roşîn Mûsa diyar kir ku dewleta tirk şerê Ukranya kir fersend û her çar parçeyên Kurdistanê kiriye hedef û wiha got: " Dewleta tirk a dagirker her fersendê destkeftiyên gelê kurd dike hedef. Di vê demê de divê hemû destkeftiyên di destê kurdan de ji bo azadiya Kurdistanê bê seferberkirin. Cîhan li ber êrîşên li ser Mexmûr, Şengal û Rojava û qadên gerîla bêdeng e. Li ber êrîşên kîmyewî bêdeng in. Şerê dewleta tirk a li ser kurdan dike, qetlîame. Ji bo ev bêdengiya cîhanê bi dawî bibe, divê kurd têkoşîn û dengê xwe bilindtir bike. Ji bo vê jî divê kurd bibin yek. PDK a malbata Barzanî nûnertiya dagîrkeriya tirk dike. Îro li gel dewleta tirk e. Siyaseta navneteweyî destekê dide PDK'ê û dewleta tirk. Ya vê girêkorê çareser bike gelê kurd e. Partiyên siyasî yên nûnertiya vê dike, hemû hêzên ku di nava lêgerîna azadî û demokrasî û dîsa gelê kurd in."

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa axaftina xwe wiha qedand: "Bila kes xwe nexapîne. Eger ku bi ser bikevin, wê gav bi gav Başûrê Krudistanê dagir bikin. Di hedefê de Mûsil, Kerkûk û Bexda heye. Îran jî wê nesekine, wê bixwaze parçeyek bistîne. Yek ji hedefa wan herêma Çemçemal a di bin kontrola YNK'ê de ye. Divê her kes li dijî êrîşê be, xeteriyê bibîne. Her tişt di bin gefê de ye. Ji bo vî şerî vala derbixin divê di nava tevgerê de bin. Ev hêz û derfetê me heye."

# Hevserokê FEDA'yê: Dixwazin Elewîtiyê bi 'Îslam a desthilatdar' ve bikin

**Hevserokê FEDA'yê Demîr Çelîk destnîşan kir ku biryara avakirina Serokatiya Cemxaneyê biryareke destwerdana dewletê ya nijadperest, tekperest û înkarê ye, ku wê di nava baweriya Elewiyan de bibe sedema qirkirina çandî, bawerî û siyasî.**

Hevserokê Komeleya Elewiyan a Demokratîk (FEDA) Demîr Çelîk biryara Serokkomarê Tirk Tayyîp Erdogan a li ser Elewîtiyê ku dixwaze di bin sîwana Wezareta Çand û Tûrîzmê de Serokatiya Cemxane û Çanda Elewî Bektaşî ava bike, ji ANF'ê re nirxand. Demîr Çelîk anî ziman ku ev biryar gavek ji bo dûrxistina Elewiyan a ji baweriya xwe ye û destnîşan kir, bi vî rengî hewl didin baweriya Elewîtiyê ji rastiya xwe derxîne, bi ola dewletê, bi 'Îslama desthilatdariyê' ve bikin. Çelîk diyar kir, bi avakirina Serokatiya Cemxane û Çanda Elewî Bektaşî ya ser bi Wezareta Çandê re wê ferz bikin ku Elewîtî baweriyek nîne, tenê şîroveyeke çandî ya Îslamê ye û wiha dewam kir, "Bi rêya hin Elewiyên ku serê xwe li ber desthilatdarî û dewletê tewandine, wê welê nîşan bidin ku bersivê didin hin daxwazên ji rêzê yên Elewiyan. Sazî û rêxistinên Elewiyan ên serî natewînin û li ber xwe didin jî wê terorîze bikin û ji hev belav bikin. Wê li ser Elewiyan ferz bikin ku bi ola dewletê ve bêne girêdan, wê sûfîzmê ferz bikin."

Demîr Çelîk ragihand ku hin saziyên Elewiyan vê biryarê weke "danîna qeyûman li ser cemxaneyan" pênase dikin, lê belê ev yek tespîteke têrker nîne û got, tayînkirina qeyûman kiryareke demkî ye, lê belê ev biryar destwerdana dewleta nijadperest, înkar û tekperest e ku wê di nava baweriya Elewiyan de bibe sedema qirkirina çandî, bawerî û siyasî ya giran.

**'Wê mezheba îslama desthilatdar ferz bikin`**

Çelîk destnîşan kir ku divê mirov û saziyên Elewî zanibin ew di pêvajoyeke gelekî zehmet de ne, lazim e bi vê têgihiştinê tevbigerin û got, "Tişta ku desthilatdarî, dewlet dixwaze bike ew e ku bi rêya Serokatiya Karên Diyanetê destwerdanên civakî, bawerî, çandî, siyasî û îdeolojîk e. Mejiyê înkarê yê ku hewl dide Îslam a Çandî veguherîne ola dewletê, wê li ser baweriya Elewîtiyê jî mezhebbûyîna Îslam a desthilatdariyê, ol a dewletê ferz bike."

**'Ditirsin ku bi tyevgera kurd re tevbigerin`**

Çelîk ragihand ku Erdogan û dest-



hilatdariya AKP'ê pragmatîst e, bi hesabê hilbijartinê vê gavê diavêje û got, "Dewlet ji rêxistiniya berfireh û xurt a Elewiyan aciz e.

Gelekî ditirse ku di vê demê de tevgera Elewî bi tevgera siyasî ya Kurd re tevbigere. Bi dîtina min ev biryar destwerdanek, gavek ji bo astengkirina nêzîkbûna li hev a van herdu dînamîkên bingehîn e."
***ANHA***



## DAIŞ û Erdogan

**Farûk SAKIK**

Piştî pêla Bihara Gelan di sala 2011'an de gihîşt Sûriyê, hemû rêxistinên cîhadî turikê xwe dan ser milê xwe, berê xwe dane Rojhilata Navîn. Li ser berjewendiyên siyasî û şexsî li hev nekirin, parçe parçe bûn. Carna jî hin hêzan-dewletan ji bo berjewendiyên xwe ew ji hev qût kirin. Kê navek dît ji xwe re rêxistinek ava kir.
Ji van rêxistinan yek jî, DAIŞ bû. Rêxistinek, organîzasyonek bi vî rengî di sala 2014'an de ket rojeva cîhanê. Her çiqas 15'ê cotmeha 2006'an li parêzgeha Iraqê Enbarê bi navê "Dewleta Îslamî li Iraqê" hatibe avakirin jî, esas wek DAIŞ bi nav kirin, di sala 2014'an de bû.
Di nîsana sala 2010'an de, Omer el-Bexdadî ku xwe wek emîrê DAIŞ'ê ragihandibû, hat kuştin û li şûna wî Ebû Bekir el-Bexdadî wek xelîfe hat diyarkirin. Em ê behsa hovîtiya vê rêxistinê nekin. Em ê ev rêxistin sibê dikare çi bike, li ser vê yekê hinek kûr bibin.
Derbarê kiryarên DAIŞ'ê de hin pirs:
- Serokê DAIŞ'ê Ebûbekir Bexdadî dema ku li Iraqê di zîndanê de bû, kê pêre hevdîtin kir û çima ew serbest berdan?
- 4'ê Hezîrana 2014'an, nûçeyek mohra xwe li rojevê xist. Li gorî nûçeya rojnameya Ozgur Gundemê, roja 1`ê Hezîranê, li paytexta Urdun Ammanê, civîneke veşartî hatiye lidarxistin. Yên beşdarî civînê bûne jî nûnerê Amerîka, Israîl, Erebistana Sûdî û Tirkiye bûn. DAIŞ vê civînê de hat erkdarkirin gelo? Çi sedemî ev dewlet hatin cem hev?
- Dema DAIŞ di çileya 2014'an de ket Reqqayê û dest danî ser hemû çek û cebilxaneya wir. Wê demê hêzên koalîsyonê, Amerîka û Rûsya li ku derê bûn û çima midaxle nekirin?
- DAIŞ bi çek û hêza ku ji Reqqayê girt, di 10'ê Hezîrana 2014'an berê xwe da Mûsilê. Dema ket Mûsilê hêzên Iraqê vekişiyabûn yek çek jî bi xwe re nebiribûn û ji wan re hiştibûn. Bi aweyekî bi merasimek hatin pêşwazîkirin. Iraq'ê li ser daxwaza kê ev der radestî wan kir?
-Ez ê behsa di 3'ye Tebaxê, dagirkirin û komkujiya Şengalê jî nekim!
- DAIŞ di 15'ê îlonê de ber bi Kobanê bi rê ket, dagir kir û piştî bedelên mezin şervanên kurd çawa bersiv dan û ew der bû destpêka dawiyê. Çima koalîsyon heta kêliyên dawî sekinî?

- Lê ez ê behs bikim ku piştî têkçûna DAIŞ'ê ji bo darizandina wan tu gav nehat avetin. Gelo tirsiyan? Gelo, di pêvajoya darizandinên de sûcên hin aliyan wê deşîfre bibûya?
Ji bo vê yekê metirsî û hin şik û şupheyên me hene. Ev DAIŞ ji kokê nehat tunekirin. Hin hêzên wan ê veşartî hene. Van hêzên veşartî li Reqqa û li Dêrazorê dibin erdê de yan jî li daristanan veşartî nînin. Ev hêz li Tirkiyê li Stenbolê, li malîkaneyan an jî li resîdasan dijîn. Li benda fermana Erdogan ya rojekê ne.

Em nizanin wê Erdogan vana kengî bixe nav tevgerê. Lê dema ku em li pêvajoya hilbijartinên 1'ê Mijdarê komkujiyên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve pêk hatin dinêrin, hilbijartinên sala 2023'yan tên berçavê me! Çima em texmîn dikin? Ji ber ku di sala 2015'an di 7'ê Hezîranê de têkçûneke mezin jiya û ji bo hilbijartinên 1'ê Mijdarê pêdiviya wî bi serkeftinek hebû û rabû serî li rêbazê komkujiyan da.
Haa, hûnê bibêjin hêzên koalîsyonê, Amerîka û Rûsya wê midaxle bikin. Na!.. Çima na? bersiv li jor rêzkirîne.
Nizanim lê dibe van dewletan tehdît kiribe. Dibe ku teqînên li Fransa û deverên din bi bîra wan xistibe û wan jî erê kiribe.



# Dr. Savary: Delîla herî mezin ev e ku Akar mikur hat ku gaz bi kar anîne

Artêşa Tirk a dagirker li Başûrê Kurdiśtanê çekên kîmyewî bi kar anîbû. Dr. Beppe Savary jî di nav wê komê de bû ku wan derbarê bikaranîna çekên kîmyewî raporek amade kiribûn. Savary got "Delîla herî mezin ev e ku Akar mikur hat ku gaz bi kar anîne."

Artêşa Tirk ji 14'ê Nîsana 2022'an û vir ve li ser Başûrê Kurdistanê êrîşeke dagirker dabû destpêkirin û di van êrîşan de gelek caran çekên kîmyewî bi kar anî. Ji bo lêkolîna bikaranîna çekên kîmyewî û hevdîtina bi mexdûran Yekîtiya Bijîşkên Navneteweyî yên li Dijî Şerê Atomê (IPPNW) di navbera 20-27'ê Îlona 2022'an de heyetek şand Başûrê Kurdistanê. Lê çûna wan a ber bi herêmên şer û hevdîtina bi gelê sivîl ên ku mexdûrên çekên kîmyewî bûn, hate astengkirin.

Heyetê derbarê lêkolîn û çavdêriya li herêmê rojek berê raporek amade kir. Serokê IPPNW Swîsreyê Dr. Beppe Savary û Çavdêrê Çekên Bîyolojîk ê berê yê Neteweyên Yekbûyî Dr. Jan van Aken di rapora xwe de diyar kirin ku delîlên xurt hene ku dewleta Tirk sûcê çekên kîmyewî kiriye û bang li Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) kir ku bila lêpirsînê bide destpêkirin.

**NEHIŞTIN EM XWE BIGIHÎNIN**



**BIRÎNDARÊN LI AMÊDIYÊ**

Dr. Beppe Savary ê ku di nav heyetê de cih digire derbarê lêkolînên li Başûrê Kurdistanê û kitekitên li ser raporê ji ANF'ê re qal kir.

Dr. Savary diyar kir li Silêmaniyê wan gelek belge û dîmen bi dest xistine ku artêşa Tirk çekên kîmyewî yên qedexe bi kar anîne. Savary got "Ji me re hate gotin ku li gundekî navçeya Amêdiyê ji ber ku artêşa Tirk çekên kîmyewî bi kar aniye malbatek birîndar bûye û rewşa wan giran e. Em jî ji bo ku biçin Amêdiyê me têkilî bi PDK û YNK'ê re danî. Eniya YNK'ê tu astengî li ber me çênekir, ji me re hate gotin ku em dikarin ji Silêmanî biçin Amêdiyê. Lê qaymakamê Amêdiyê got 'Em nikarin we biparêzin' û em asteng kir.
Heke em biçûna serdana malbata ku ji ber çekên kîmyewî birîndar bûne, wê gelekî baş bûya. Ji ber ku li gorî agahiyên me stendiye, bikaranîna çekên kîmyewî di meha Îlonê de pêk hat. Hê demeke dirêj ji ser wê derbas nebûbû û me dikaribû bi hêsanî şopa çekên kîmyewî bibînin. Tedawiya kesên ji ber çekên kîmyewî birîndar bûne jî mijareke girîng bû. Gelek sal in ez wekî bijîşkê mudaxeleya lezgîn dixebitim. Divê were tespîtkirin çekên kîmyewî çiqas bandor li van kesan kiriye."

**MIKURHATINÊN AKAR JI BO OPCW BES BÛ**


Dr. Beppe Savary diyar kir ji bo ku li dewleta Tirk derbarê bikaranîna çekên kîmyewî lêpirsîn were destpêkirin, belge û agahiyên ku wan kom kirin têr dikin û bal kişand ser mikurhatina Wezîrê Parastinê yê Tirk Hûlûsî Akar. Akar gotibû 'Me gaza rondikrêj bi kar aniye.' Dr. Savary diyar kir di warê leşkerî de bikaranîna gazên kîmyewî teqez qedexe ye û got "Mikurhatineke mezin e ku Akar gotiye wan li qada şer gaza rondikrêj bi kar aniye. Ev gotin bes e ku OPCW lêpirsîneke bide destpêkirin."

Dr. Savary diyar kir piştî vê pêvajoyê êdî mûxatab OPCW û Neteweyên Yekbûyî ne got "Ev sazî li Sûriyeyê û li welatên din derbarê îddîayên çekên kîmyewî dest bi xebatê kiribûn, divê heman rewş ji bo Tirkiyeyê jî pêk were."

**HERÎ KÊM BILA BIZANIBIN KU HIN KES LÊKOLÎNÊ DIKIN**

Zanyarê Swîsreyî Dr. Savary diyar kir ku belgeyên ku wan bi dest xistine, ne belgeyên ku bêne piştguh kirin û têkildarî xebatên ku dê bikin ev agahî da: "Ji bilî rapora ku me weşandiye, ez ê bi hikûmeta Swîsreyê û Jan van Aken jî bi hikûmeta Elman re xwedî însiyatîf bin. Bi taybetî em difikirin ku divê ev her du welat Tirkiyeyê hişyar bikin. Hêvîdar im bi xebata me rê li ber bikaranîna çekên kîmyayî yên dewleta Tirk bigire. Her çend dewlet û OPCW di qada dîplomatîk de bêdeng bin jî, girîng e ku rêvebirên dewleta Tirk zanibin ku kesek ji bo lêkolînkirina van sûcan hewl dide. Ev dibe ku pêşî li bikaranîna wan a kîmyewî bigire."
***ANF***

## Pergala dewlet dijî hemû gelan e



**Memed Serdar**

Dîroka saziya dewlet, ji dewleta yekem ya Sûmeriyan heta roja îro dijî mirovayî û dijî gelan bûye. Ev taybetmendiyên weke sazî dewlet ji bingeha avabûna wî tê. Dewleta yekem û heta dewletên ku roja îro bi sedan hene, sedemê avabûna wan û hebûna wan ji bo heman armancê ne. Tarz, rê, rêbaz û ûslûbê wan de gelek ferq û cûdayî hebin jî, dema xeteriyek li ser pergala dewletî hebe, ev ferq û cûdayî hemû li aliyek tê hiştin û dikevin parastina pargala dewletî.
Pênaseya dewletê rêberê gelan Rêber Apo pir baş kirîye lê, cardin eger em bînin bîra hev; Çîn a serdest ya civakê, ji bo parastin û pêşxistina berjewendiyên xwe, saziyek ku li hember civak avakiriye dewlet e. Yanî di encam de divê wiha bê fêmkirin ku dewlet derewên weke 'sermayedar ji bo gel bixapînin dibêjin', ne ji bo xizmeta gel hatiye avakirin. Erkê dewletê yê sereke ewe ku gel weke karker yan jî leşker ji bo parastina berjewendiyên sermayedaran bikarbîne û ji bo vê yekê hatiye avakirin.
Eger bi vê perspektîfê lê binerin, ew gazincên di nava gel de hene bê wate dimînin, ku gelek kes dibêjin; 'rewşa gel ne başe, dewlet çima tedbîrên pêwîst nagire!'. Rewşa gel ne di xema îdareya dewletê de ye. Îdare yan jî desthilatdariya dewletê, tenê hewl dide ku desthilata xwe bidomîne.

Niha bi vê heqîqetê li dewletên herêmê binerin rewşa wan hinek kêm hinek zêde wek hatiyê gotin e. Dewleta Tirkiyê aloziyek mezin ya aborî jîyan dike. Bi milyonan gel di bin asta birçîbûnêde jiyan dikin. Bi milyonan cûwan rê digerin ku biçin derve. Lê ne xema desthilatdariya Tirkiyê ye. Carna ji ragihandinê yek pirs bike jî şefê faşîst Erdogan dibêje, 'rewş başe çi pirsgirêk nîne'. Çîn a ku ew temsîl dikin rewşa wan başe raste. Lê gel li ser sergoyan xwarinê kom dikin.
Heman rewş li dewleta Sûrî jî tê jiyankirin. Li Sûrî dolar her roj bi îstîqrar bilind dîbe û bankê navendî pêwîstîyê mûdaxeleyê nabîne. Ji ber tebeqeya ew temsîl dikin rewşa wan başe. Lê gel bi ratibê ku digrin 3 roj nikarin jiyan bikin. Her wiha desthilatdariya Sûrî jî dibêje, rewş başe.

Ev her du dewletên kevnar û riziyayî di nava xwe de gelek pirsgirêk jiyan dikin. Li ser vê rewşê jî di nava şerekî dijwarde ne. Her du dewlet jî hem di nava xwe de di nava şerekî girande ne, hem jî derve de di nav şerde ne. Hember hevdû di asta herî jor de dijminayî dikin, ji bo welatê hevdû xirab bikin çi ji destê wan tê dikin. Lê dema xeteriyek yan jî bedîlek ji bo pergala dewletî pêş dikeve, ew nakokî û dijminayiya kûr dikarin deynin aliyekî û hember wê xeteriyê yan jî pergala bedîl cardin jî hevdîtin û îttîfaqan bikin. Ev sekna wan ya dijî gelan û dijî exlaqê mirovayî eger beriya sed sal bihata jiyankirin, ji ber teknîk û teknolojî hîn pêş neketibû dikaribûn li gor keyfa xwe karê xwe bimeşînin. Lê niha her tevgereke wan ya ji rêzê jî heman kêliyêde cîhan hemû pê dihesin û rûreşiya wan her kes dibîne.

Rêjîma Sûrî û Tirkîye rûxmî ewqas gef û dijminayî bi fermî îlankirin ku dest bi hevdîtinan kirine. Ev her du rêjîmên ku hember gelê xwe pir hişk û dogmatîk bûn, çi çebû ku wiha zû her tiştek danîn aliyek û dora maseyek kom bûn. Diyare ku hêzeke mezin xeterî li ser pergala dewletî dît û bi yek talîmatek van herdû rejîmên kevneperest li dora maseyek kom kir.

Her wiha ew bi xwe diyarkirin ku hatina ser masê bi yek rojevek tenê ye. Ew rojev çîye? Weke ku di dîrokê de heta niha gelek caran hatiye jiyankirin, dijminên gelê Kurd eger rûxmî hemû nakokiyên xwe yê navxweyî tên cem hev kom dibin, rojev komployek dijî Kurd e.

Gelê Kurd û gelên herêmê hember komployan û hember hemû tevgerên dijminane xwe amade kirine. Lê hêz û rêjîmên ku di nava komployan de cîh digrin dive vê heqîqetê ber çav bigrin ku, piştî ev rojên teng derbas bûn, çawa bi van gelanre biratî û cîrantî bikin. Bi dijminê gelanre hevdîtin û îttîfaq bixwere qûtbûneke rûhî û fîzîkî bîne. Divê her kes hesabê xwe rast bike, poşmaniya dawî feyde nake.